

Çawa dikarin dermanê xwe bi ewlehî (bêyî tehlûke) bi kar wînin?

- Ligor rêberiya li ser kaxiza agahdarîyê (ya li ser qutiyê) bike.
- Bizanibe kengê dermanê xwe bi kar wîni û çîqa.
- Xwedîrola çalak (active ingredient) di dermanê xwe de bizanibe.
- Lîsteyeke nivîskî ya dermanên te dikare alîgir be, doktor û dermanxaneya te ji dermanên te haydar in.

Xwedîrola Çalak (active ingredient) çi ye?

- Xwedîrola çalak tiştê dermanê te dixebitîne ye.
- Kaxiza li ser dermên bixwîne bo misoger bikî du yan bêtir ji dermanên te yê wek hev xuya dikin ne xwediyên heman xwedîrola çalak in (active ingredient).
- Peywindiyê bi doktorê xwe yan bi dermanxaneyê re deyne heke ji dermanekî te bêtir xwediyên heman xwedîrola çalak bin.

Çawa dikarin xwedîrola çalak bibînin?

- Ji doktor yan ji dermanxaneya xwe bipirse.
- Xwedîrola çalak li ser qutiyê dermên nivîsandî ye.
- Lîsteyeke navên xwedîrolên çalak yê dermanên xwe bihêle. Dikarî wêneya dermanan yan lîsteya navên wan bi xwe re bihêlî.

Çawa dikarin di kîrîna dermanên xwe de pereyan biparêzim?

- Derman dikarin bi navên cuda bin - navê xwedîrola çalak û navê dermên (navê resen wekî ku şirketa ew çêkirî daniye yan navê dermanê hatî kopîkirin yê wek "generic" tê nasîn).
- Pîrriya caran dermanê "generic" ji yê resen arzantir e, tevî ku herdu bi heman xwedîrola çalak in.
- Heye ku doktorê te yan dermanxaneya te dermanê "generic" ji te re pêşniyaz bikin, bo parastina pereyan.

Dikarin dermanê xwe bi endamên malbatê yan bi hevalên nexweş re pareve-bikim?

- Na, dermanê te tenê bo te ye.
- Heye ku bo endamên malbata te yan dostan tehlûke be, ger dermanê te bi kar wînin.

Çawa dikarin di dema nexweşiya korona de (COVID-19) li dermanên xwe miqayit bim?

- Dermanên xwe ligor rêberiya doktorê xwe bi kar wîne.
- Miqayit be dermanên te yê bi raçêt bo mehekê (heyvekê) hene.
- Eger pêdiviya te bi çûna nexweşxaneyê hebe, dermanê xwe yan lîsteya navên dermanê xwe bi xwe re bibe.

Dikarin derheqê dermanê xwe de bi kê re biaxafim?

- Bi doktorê xwe re yan bi dermanxaneya xwe re biaxafe. Ji wan re bibêje eger pêdiviya te bi wergêr hebe.
- Telefona Xeta Dermanan (Medicines Line) bike, li ser jimara 1300 633 424. Ji bo wergera telefonî ya belaş, telefona Xizmeta Wergerê bike (Translating and Interpreting Service, TIS) li ser jimara 131 450, zimanê xwe bi nav bike û Xeta Dermanan bixwaze.



Xwedîrola Çalak

